HDP

BULTENA ÇANDINIYÊ YA HDP

2021/Hêjmar: 3

## DI ÇANDINIYÊ DE ŞIRKETBÛN ÇIQAS ZÊDE BIBE KEDXWARÎ JÎ EWQAS ZÊDE DIBE!

- Li gorî daneyên TUIK'ê sektora çandiniyê di sala 2020'an de di çaryeka yekemîn de ji sedî 1,8 di çaryeka duyemîn de ji sedî 3,7 di çaryeka sêyemîn de ji sedî 6 û di çaryeka dawîn de ji sedî 4 mezin bûye. Di pêvajoya şewba Covid-19' ê de, cotkar û alajdarên ku di vê mezinbûnê de xwedî keda herî mezin in, mixabin berdêla keda xwe negirtin û heqê wan hat xwarin. Digel şewba Covid-19'ê, cotkar û karkerên ku di sektora çandiniyê de dixebitin bi fedakarane kar û xebatên xwe domandin. Her çi qas mesrêfên mazot, gubre, tov û jehrên çandiniyê ji sedî sed zêde bibin jî, cotkar hilberên xwe digel zerarê gihandin. Ji bo ku mehsûl û berhemên xwe veguhêzin têberan, kedkarên çandiniyê bi mûçeyek kêm dixebitin.

- Ji sedî 77 heseya Şîrketa Anonîm ya Berhemên Goşt û Şîr ya Trakya'yê bi 28,5 milyon dolaran firotin fîrmaya Siniora Food Industries a ku navenda wê li Ûrdinê ye. Her çiqas di çandiniya Tirkiyeyê de pardarbûyîna fîrmayên niştecih û yên biyanî beriya 1980'yan dest pê kiribe jî, piştî biryarên 24'ê Rêbendanê beşdarên vê pardarbûyînê gelek zêde bûne. Ji ber ku pergala çandiniya Tirkiyeyê bi desthilatiya şîrketan ava bûye, dema dahatên ji çandinê zêde dibin bi tenê şîrket jê par digrin û cotkar jê mehrûm dimînin.
- Di navbera salên 1980 û 2000'an de hêjmara şîrketên biyanî yên di warê çandiniyê de ji 70'yan derket 204'an, di navbera 2002 û 2006'an derket 258'yan û ji 2006'an heta niha ev hejmar nêzî 2000'an e.

- Polîtîkayên neolîberal di sektora çandiniyê de jî rê li ber sermiyandariya pirneteweyî vekir. Komên sermayedar ên niştecih pardariyên xwe bi şîrketên pirneteweyî re zêde kirin û di gelek beşên wek hilberîna goşt, şîr, pêmayên şîr, çay û xwarinên qerisandî; çinîna sebze û fêkiyan; û bazirganiya mehsûlên xurek de xebatên şîrketên biyanî jî her diçe xwe zêde dibin.

**Xuyang 1: Şîrketên biyanî yên li Tirkiyeyê û pardariya wan**

| Beşa Hilberînê | **Şîrket û Marqe** | **Para Bazarê, Texmîni. %*** |
|---|---|---|
| Şîr û adan | Danone-Tikveşli | 10 |
| Miqarne | Barilla / Filiz | 30 |
| Bestenî | Unilever (Algida) | 70 |
| Epika Pitikan | Numil/Danone (Milupa, Bebelac) | 90 |
| **Cibs** | Frito-Lay (Ruffles, Doritos), Kraft (Cipso, Patos), P&G (Pringles) | 90 |
| Şorbeya Berdest | Unilever (Knorr), Nestlé (Maggi) | 70 |
| **Kâse margarin** | Unilever (Sana, Becel) | 50 |
| Rûnê Gulberojê | Savola Group (Yudum) | 15 |
| Çîkolate | Nestlé, Kraft (Milka), Unilever (Algida) | 30 |
| Şekirok | Cadbury (Kent), Haribo | 70 |
| Şekirê bi Nîşa | Cargill, Amylum, Cargill/Ülker (Pendik Nişasta) | 80 |
| **Benîşt** | Cadbury (Falım, First), Perfetti Van Melle (Vivident) | 90 |
| **Çay** | Unilever (Lipton) | 15 |
| **Qehweya Berdest** | Nestlé (Nescafé), Kraft (Jacobs) | 80 |
| **Ava Ambelajkirî** | Erikli /Nestlé, Danone (Hayat),Damla (Coca-Cola) | 25 |
| **Avmêwe** | Coca-Cola (Cappy) | 25 |
| **Vexwerên Qolayî** | Coca-Cola, Pepsi | 75 |
| **Yektaciriya bi Sazûmanî** | Migros, CarrefourSa, Metro | 60 |

- Fîrmaya Yorsanê ya ku di sala 1964'an de hatibû avakirin, ji sala 2014'an pêve ji aliyê Abraaj Group ya Dûbaiyan tê birêvebirin. Şîr û pêmayên şîr ên marqeya Dostê û şîr, dew, mast û penîr ên marqeya Ulker'ê ji aliyê şîrketa girse ya Fransî Groupe Lactalisê di sala 2015'yan de hat standin.
- Di sektora qehweya berdest de, ji sisêiyan du (2/3) parê bazarê di bin serdestiya Fîrmaya Nescafe'yê de ye. Pişesaziya margarînê ji sedî 90 di destê Unilever'ê de ye û ev fîrma hema bêje giştika sektorê kontrol dike.
- Li Tirkiye'yê sektora ava di şuşeyên pet de ji sedî 60 di destê fîrmayên biyanî de ne û tevayî bihayê vê sektorê li dora 4,5 – 5 milyar dolaran e. Marqeyên biyanî yên di vê sektorê de xebatên xwe di bin sîwana van şîrketan de peşkeş dikin; Hayat ya Danoneyê, Damla ya Coca-Colayê , Erikli ya Nestleyê û Aqua jî ya Pepsiyê ne.
- Filiz Miqarne ji aliyê şîrketa Barilla G.e.R Fratelli S.p.A. ya Îtaliyan ve di sala 2003'yan de hatibû standin. Şîrketên girse yên Japonî Nisshin Foods ve Marubeni Corporation, di sala 2014'an de bibûn parmendên Nuhun Ankara Miqarne'yê.
- Fîrmaya Namet'ê ya ku hilberîna pastirme û benîgoştan dike, di sala 2014'yan de bi şîrketa Behreynî Investcorpê re parmendî pêk anî. Fîrmaya mirîşkvaniyê ya Banvit di sala 2017'yan de ji aliyê şîrketên BRF ya Brezîlyayî û Qatar Investment Authority ya Qeterî hate standin.
- Di sala 2014'an de Oltan Gida ya ku li Tirkiyeyê 12 salan li ser hev îxracata herî mezin ya findiqan kirîbû hat firotin, Oltan Gida ji aliyê şîrketa Ferrero ya Îtaliyan hatibû standin û di sala 2017'an de navê şîrketê wek "Ferrero Findik" hat guhertin. Di sala 2015'an de tevayî îxrecata findiqan bi qasî 2,8 milyar dolaran bû, ji sedî 46 ê vê îxracatê ji aliyê şîrketên navneteweyî pêk hat.

- Bihayê tevayî sektora ew benîşta ku em dicûn jî bi qasî 450 milyon lîre ye û ev bazar ji sedî 90 di bin destê şîrketên biyanî de ne.

**DI SALA 2020'AN BIHAYÊ HILBERÊN ÇANDINIYÊ ZÊDE BÛN**

- Di sala 2020'an de li Tirkiyeyê, tevayî bihayê hilberîna giyayî 245,2 milyar lîre bû. Dema em ji hêla Lîreya Tirkan lê binêrin dibe ku zêdebûnek çavên me bixapîne , lê mixabın, dema em ji hêla Dolara Amerikî lê binêrin ev zêdebûnek pir bêqîmet e. Di sala 2020'an de tevayî bihayê hilberên giyayî 34,9 milyar dolaran bû, ev hêjmar di sala 2019'an de bi qasî 38,8 milyar dolaran bû.

- Li gorî daneyên TUIK'ê yên bi salane; bihayê genim ji sedî 23,64 yê garis ji sedî 18,12 yê çeltûk ji sedî 25,72 yê cehê ji bo bîrayê ji sedî 16,97 yê cehê din ji sedî 19,37 yê çewder ji sedî 32,3 zêde bûne.
- Di sala 2020'an de, li gorî sala pêşî, fiyeta zebeş ji sedî 44,76 ya petêx ji sedî 34,66 ya xiyar ji sedî 9,05 zêde bûne. Ligel van daneyan fiyeta hinek hilberan jî ketin; ya pîvaza hişk ji sedî 7,78 ya îsota salçeyê ji sedî 9,02 ya îsota dolmeyan ji sedî 2.02 û ya bexdenûs ji sedî 18,67 kêm bûne.


- Fêkiyên ku li gorî sala pêşî fiyeta wan zêde bûne ev in; fiyeta pirteqala washîngton ji sedî 42,35 ya leymûnê ji sedî 20,11 ya sêva ji sedî 18,57 û ya tiriyê bidendi ji sedî 15,85 zêde bûne.

- Serkarê Giştî yê Alajdariyê ya Wezaretiya Çandinî û Daristanan dazanîn ku ewê di sala 2021'an de di 3 serdeman de îthalat bê kirin. Her çiqas Wazîrê Çandinî û Daristanan Bekir Pakdemirlî di daxuyaniyên xwe yên pêşî de qala qedandina îtxalata alajan kiribe jî hemû kiryarên wan rê bêhtir li ber îthalatê vedike. Mixabin, gotin û kiryarên wan hev û din nagirin.

- Ofêsa Mehsûlên Axê (TMO) dev ji îhaleyên itxalatê bernade, di 18'ê Adara 2021'an de ji bo standina 115 tonan garis careke din îhale vekir.


- Di Bernameya Nûsaziya Abriyê ya ku Serokkomar Recep Tayyip Erdogan diyar kir de tu berjewendiyek ji bo cotkar û kedkaran tune ye. Di vê bernameyê de AKP dîsa dixwaze bi mijarên xapînok cotkar û kedkaran eware bike. Hîn qala enflasyon, pêşî li destbelaviyê birinê û hedariya fiyetan dikin. Ev 19 sal in van gotinan dubare dikin lê ji bo wan tu gavek pêşketî danakin.
- Dewleta Yekikitiya Amerikayê (DYA), di vê pêvajoyê de di sektora çandiniyê de piştgiriya bi qasî 12 milyar dolaran bi cotkaran re kir.

- Rûsya ji îsal di warê çandiniyê de ixrecata xwe ji sedî 22 zêde kir. Di her sê mehên pêşî yên 2021'an de, Tirkiye bi bihayê 991 milyon dolaran hilberên çandiniyê ji Rûsya'ê îthal kir.




Li gorî rapora Neteweyên Yekbûyî (NY), di sala 2019’an de li seranserê Dinê nêzikî 931 milyon tonan xwarin û xurek hatîne îsraf kirin. Li Tirkiye’yê ev hêjmar bi qasî 7,7 milyon tonan e. Tirkiye di îsrafa xwarin û xurekan de di rêza sêyemîn de ye.

**Hilberên Çandiniyê yên Demsalî, Meha Adarê**




Çavkanî: Komel a Buğday'ê

**Niha Demsala Gehîştina wan e**

Zerşêrîn, Sêv, Pincar, Leymûn, Gulkelem, Baqle

**Di Nêzde li ser Dezgehan in**

Tûfiringî, Barbûn, Alûçe

**Demsala Wan Dibuhure**

Pırase, îspenax, Kelerim
Pirteqal

**Xuyang 2: Fiyetên Çend Hilberan (di demsala xwe de)**

| Hiber, Kg | Li Zeviyên Mêrsîn'ê | Hala Mêrsîn'ê | Mêrsîn, li ser Dezgeh | Li Hala Stenbol'ê | Stenbol li ser Dezgeh |
|---|---|---|---|---|---|
| **Sorkelem** | 30 quriş | 50 quriş | 1,5 TL | 1,5 | 3,5 |
| **Leymûn** | 1 TL | 1,5 TL | 4 TL | 3 TL | 6 TL |
| **Gêzer** | 30 quriş | 70 quriş | 2 TL | 1,70 TL | 4 TL |
| **Pirase** | 1 TL | 1,5 TL | 3 TL | 2,5 TL | 5 TL |
| **Ispenaq** | 1 TL | 1,5 TL | 3,5 TL | 3 TL | 5,5 TL |
| **Zerşêrîn** | 6 TL | 9 TL | 12 TL | 11 TL | 14 TL |

Çavkanî: Hala Mezin ya Mêrsîn'ê

*Not: Fiyetên di xuyangê de hatine nivisandin yên herî kêm in, dibe ku di van fiyetan de cîh bi cîh cudahî çêbibin.*

**Di Meha Adarê de Xuyakirina Çandiniyê**

Meha Adarê bi şahî û şînayî ya xwe mizginiya biharê dide gelan û li deşt û zozanan dem dema kulilkvedanê ye. Jinûvebûna xwezayê banga bixwevahatinê dike û Newroz vejînê bi xwe re tîne û derî li bihara rengîn vedike.

Mirovatî di demsala biharê de her ku bi axê, bi xwezayê û bi çandiniyê re mijûl dibe çavdêrî li jinûvebûna xwezayê dike. Ji ber vê yekê kar û barên çandiniyê pêwandiya mirov û xwezayê zindî dihêle û ev yek civakê jî dişêwîne. Hilberên li ser sifreya me bi xwe re çîrokên piralî jî tînin; xuyanga li jor jî dide ber çavan ku keda cotkaran bi çi hawayî tê xwarin. Ew cotkarên bi derfetên teng ji bo têberan hilberan derdixin holê ji desketiyan mehrûm tên hiştin. Mixabin, barê herî giran û destheqa herî kêm dibe para cotkar u kedkaran. Kesên ku çavên xwe berdana keda cotkaran piranî desketiyên çandiniyê ji xwe re hildidin û zehmetiyên vê pêvajoyê jî ji xebatkarên kedyar re dihêlin. Ew kes nizanin ku meha Adarê ji bo cotkaran xwedî wateyek çawa ye. Ew li ser keda cotkaran bêrîkên xwe tije dikin, lê li hêla din, cotkar jî roj bi roj di nava deyn û qrediyan de digevizin. Li gorî daneyan sektora çandiniyê ji sedî 4,8 mezin bûye, bêguman di vê mezinbûnê de pêkerê sereke keda cotkaran e. Ev rastî careke din kedxwariya di çandiniyê de bi hawayekî zelal dide ber çavan. Yê ku rê li vê kedxwariyê û neheqiyê vedike îqtîdara AKP'yê bi xwe ye.

Em wekî Partiya Demokratîk a Gelan bi gelên xwe re heman hêstan parvedikin. Di bultena me ya vê mehê de, mijarên balkêş yên di warê çandiniyê de me bi daneyan da ber çavan û destnîşan kir ku hemû pirsgirêk ji ber şêweya hilberîna kapîtalist derdikevin holê. Berpisyarê vê kedxwarin û newekheviyê berîya her tiştan polîtikayên AKP'yê ne.

Sala 2020’an hem ji ber xizanîyi û hem jî ji ber şewba koronavîrusê ji bo gelên Tirkiyeyê pir bi zehmet derbas bû. Di civaka kedkar û bindestan de tengasî û xizanî bêhtir belav bû, îqtîdara AKP'yê û alîgirên wan di vê pêvajoyê de tu tiştek ji xwe kêm nekirin. Sektora çandiniyê ji bo mirovan pir girîng e, ger hilberîna çandiniyê bisekine jîyan jî jixweber disekine. Lê belê hikûmeta AKP’ê hema bêje qet piştgirî nade hilberîneran û guhê xwe li daxwazên cotkaran digire. Hikûmeta AKP’ê di sala 2019 pereyê pesartinê neda cotkaran, ew pereyê ku cotkar ji berê ve heq kiribûn niha wekî piştgiriyek tê nîşandan. AKP bi vê rengê dixwaze raya giştî û taybetî cotkaran bixapîne. Taloqkirina dayinên pesartinê ne piştgirî ye. Bi vê pesartina derengmayî cotkar hîn nikarin zirarên xwe çareser bikin. Deynê qrediyan bi qasî 6 mehan paşvedixin û vê yekê wekî piştgiriyêk dihesibînin. Herwiha alîkariya toximan jî bi tenê li çend bajaran hate kirin û ji bo bajarên din tu hewldanek pêş naxin. Ew piştgiriya ji bo gubre hatibû dayîn bi zêdebûna dowîz re heliya, ji ber ku fiyeta gubre zêde bû tu fêdeyek vê piştgiriyê li cotkaran nebû.
Digotin ewê zevîyên xazîneyê ji bo çandiniyê bê bikaranîn û li her qadê li ser vê mijarê propagandaya xwe kirin, lê hîn 4 milyon hektar zeviyên xazîneyê betal hatiye hiştin. Erdên zevî û daristanan ji mitahîtên alîgir re tê pêşkeş kirin û ev erdên berdar bi avahiyên beton tên veguherandin. Kedkarên çandiniyê yên demsalî, di sala 2020’an de, bi kêmtirîn mercên jiyanê û di rewşên bêtemînat de hatin xebitandin.
Divê em bi rêjeyên mezinbûnê nexapîn, cotkar û kedkar ji vê mezinbûnê tu fêdeyek nagirin. Ji ber ku di pêvajoya şewba koronavîrusê de xebatên bazirganiyê li hawir dora dinê sekinîn, ev mezinbûn bi tenê ji hêla navxweyî bandora xwe nîşan da. Tu qîmeta vê mezinbûnê di bazara navneteweyî de tune ye. Di bazara navxwe de jî rewşek wiha derdikeve holê; ji ber ku fiyeta hemû hilberan zêde bûne piraniya gelan nikarin xurekên baş û erzan bi dest bixin. Êdî hilberên ku di demsalên xwe de digîjin jî giranbiha ne, ji bo gelan ‘erzanî’ bûye çîrokeke kevin. Di gel vê xizanîyê, destbelavî jî didome. Ji hêlekê gelên belengaz nikarin xwarin û xurekan bi dest bixin, li hêla din di salê de nêzi 8 milyon ton xwarin û xurek berhewa tê îsraf kirin.

Hemû daneyên meha Adarê careke din vê rastiyê dide ber çavan; ji hilberînê heta xerîdariyê, ev pergal her ku ketiye bin kontrola sermiyandaran, taybetî sermiyandarên biyanî, bêhtir kedxwarî û newekheviyê bi xwe re aniye.

HDP Genel Merkezi; Barbaros Mh
Tahran Cd Büklüm Sk No:117
Kavaklıdere/Çankaya ANKARA
Tel: 0312 427 17 80
Fax: 03124288957

@HDPgenelmerkezi

www.hdp.org.tr

HDP